

JI MÎTOLOJÎYÊ BER BI TARÎXÊ
Û JI LEHENGÎYÊ BER BI EVÎNÊ
DESTAN WEKU ÇEMKEKE SÎWAN
DI VEGÊRANA GELÎ DA

Kenan Subaşı

Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
kenanenado@gmail.com kenansubasi@artuklu.edu.tr <https://orcid.org/0000-0001-7744-1646>

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 24 Ocak 2024 **Accepted / Kabul Tarihi:** 28 Nisan 2024

DOI: 10.26791/sarkiat.1425264

Ji Mîtolojîyê Ber Bi Tarîxê û Ji Lehengiyê Ber Bi Evînê Destan Weku Çemkeke Sîwan Di vegêrana Gelî Da

Kurte

Zanista Gel (folklor) qadeke zanistê ye ku çanda madî û manewî ya milletekî tesbît dike, berhev dike, disenifîne, dirixîne û paşê ji bo xwenasîna wî milletî yan milletên din yê cîhanê van agahiyan pêşkêş dike. Mîna hemû zanistên modern dema zanyarên folklorê vî karî dikin hewcedarî bi dabeşkarî û nasîna cureyan dibînin. **Çimkî** bi demê ra jîyana gel yan jî folklor weku yekûneke yekpare namîne û gelek cure û binecureyên wê **çêdibin**. Bêguman yek ji van cureyên sereke yê folklorê jî edebiyata gelî ye. Herwiha di nav edebiyata gelî da jî gelek binecure hene. Di vê xebatê da me jî di nav van binecureyên edebiyata gelî da vegêrana gelî û pê ra jî peywendîdar cureyê destanê hîlbijart û li ser xebitîn. Amanca vê xebata me destnîşankirina **çemka** “destan”ê weku **çemkeke** sîwan e ji bo vegêranên epîk **ên** Kurdî. **Çimkî** weku lîteratur tevlihevîyeke eyan heye di nav xebatên kurdî da û herwiha pîrnavîyeke berbelav. Di vê xebatê da me vegêranên epîk **ên** Kurdî ji hêla binyata rêzerûdanê ve nirxandin û li ser wê esasê senifandineke destanên Kurdî pêşkêş kir. Dema me ev xebat kir, digel pêşniyazên xwe, me berê xwe da nîqaş û bikaranînenê **çemkê** û gelek **çemkên** din yê ji bo vî cureyî di nav xebatên folklorê yê Kurdî da.

Bêjeyên Sereke: Folklor, Destan, Leheng, Evîn, Mîtolojî, Tarîx.

Epic As an inclusive Term in Folk Narratives From Mythology to History, From Heroes to Love

Abstract

The branch of science that identifies, compiles, classifies and analyzes the material and spiritual culture of a nation is called folklore. Folklorists use folklore studies to recognize a nation itself or to introduce itself to other nations of the world. Folklorists who carry out these studies need to recognize and classify their field of science as in other branches of science. Because this field, which we call folk life, does not maintain its continuity as a whole and is divided into different branches and sub-branches over time. Undoubtedly, one of the important branches of folklore is folk literature. However, folk literature is also divided into many sub-branches within itself. In this study, we have studied folk narratives, which is one of the sub-branches of folk literature, and the epic/dastan genre within it. Our aim in this study is to show and use the term “epic/dastan” as an inclusive term for all other Kurdish epic narratives, since, in Kurdish folklore studies, there is a clear confusion of literature and a problem of polysemy. In this study, we have created a new classification of epic narratives by analyzing Kurdish epic narratives in terms of event chain structure. In addition to the classification and suggestions we put forward in this study, we have also shared the studies and discussions on this subject in the field before us.

Keywords: Folklore, Epic/Dastan, Hero, Love, Mythology, History.

DESTPÊK

Edebîyata gelî hizir, derbirîn, hest û vegêrana miletekî û parçeyek ji folklorê ye ku bi devkî û ziman tê îcrakirin. Li gorî teşe û mijaran gelek şax û cureyên vê edebîyatê bi disîplînîzebûna folklorê xisûsen piştî nîveka yekem a sedsala 19an hatin binavkirin û senifandin. Destanên evînî yên mêjûyî di nav vegêrana gelêrî da cureyekî berbelav û pîrnimûne ye. Di eslê xwe da hem di folklorê cîhanê bi giştî hem di folklorê Kurdî da gelek nîqaş û tevlihevî li ser pênase û senifandina cureyên edebîyata gelî hene. Digel van nîqaş û tevlihevîyan ji ber lazimîya xebatên naverokî, teşeyî û qadî di vî warî da jî senifandin û jihevqetandina cureyan bûye zarûretek.

Ev dabeşkarî hebki xisûsiyeta zanista modern û nêrîna atomîst e. Divê yekûnek dabeşî hemû parçeyên xwe bibe da ku meriv bêhtir karibe lê kûr bibe û tê bigihîje. Îcar di qada Kurdî da xebatên bi vî rengî li gorî cîhanê bi derengî dest pê kir. Herçiqas hewldanên ewil bi xebatên Kürt Neşr-i Maarif Cemîyetî (Komaleya Belavkirina Zanî û Weşanê) dest pê kiribe jî ev tenê destpêkeke kurt û teng bû (bnr. Bozarlan, 1985). Piştî xebatên Kurdên Sovyetê û Kovarên weku *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nûyê* û piştî xebatên başûrê Kurdistanê û xebatên bîst salên vê axiriyê yên di akademîya bakurê Kurdistanê da bi xwe ra gelek ceribandî û pênaseyên nû anîne (bnr. Cindî - Evdal, 1935; Celîl – Celîl, 1978; Mistefa Resûl, 2010; Resûl, 2008; Keskin, 2019). Lê îroj hê jî pênase, senifandin û sînorên hin cureyan bi nîqaş e û nehatiye safikirin û xebatên folklorê Kurdî li dû rêyeke çareserî û zelalîyê ye. Bi taybetî vegêranên ku weku destan, hikayet û beyt tên binavkirin ji hev nehatine safikirin (bnr. Kaplan, 2020; 2022; Subaşı, 2022). Helbet çend sebebên vê nezalalîyê hene. Yek jê xebata li ser vegêrana gelêrî ya Kurdî bi nêrîna bîyanî û xisûsen Tirkan pêk tê. Dema ku xebat bi tenê li ser esasên xebatên folklorîstên bîyanî teşe digirin, dînamîkên vegêrana gelêrî yên Kurdî ji hêla folklorîstên Kurdan ve tên jibîrkirin. Loma ev nêrîn neguncîn û tevlihevîyê bi xwe ra tîne. Bo nimûne dema meriv senifandina Pertev Naili Boratav (2011, 15-38), İlhan Başgöz (2012, 11-29) û M. Öcal Oğuz (2008) a ji bo destanên evînî yên mêjûyî/hikayetên gelêrî (halk hikâyeleri) yên Kurdî esas bigire mimkûn e meriv di çend cihan da bixelite. Berî her tiştî di navbera îcrakeran da ferq heye. Dengbêj bê enstruman distrên û vedigêrin, aşîq bi saz û tembûrê distrên. Herçiqas weku îcraker hozan û aşîq di Kurdî da hebin jî dengbêj di nav Tirkî da tunene. Weku din piraniya halk hikâyeleri/hikayetên gelêrî yên Tirkî bi gihiştina hev a evîndaran bi dawî dibe (Pehlivan, 2021: 53)¹, lê di destanên evînî yên mêjûyî yên Kurdî da bi piranî bi negihiştina hev û mirinê bi dawî dibe. Herwiha digel ku di piraniya hikayetên tirkî da şopên lehengiyê/destanê yan epîkê kê mûne bûye yan ji holê rabûbe jî di destanên evînî yên mêjûyî yên Kurdî da hîn şopên lehengiyê/epîkê eşkere û zindî ne. Helbet digel van ferqan gelek motif û binyatên hevpar jî hene di navbera van hikayetên miletên cuda da. Lê ev nayê wê manayê ku di senifandin û pênaseyê da divê em yek bi yek yên bîyanî texlît bikin. Em dikarin li ser binyata nerîta Kurdî ya devkî esasekê daînin.

1. Nîqaş

Destan tê manaya komîja tilî û pêçiyên û rêza wan a li cem hev. Weku “desatîn” jî tê binavkirin ku di teorîya muzîka pêşwext da weku navên meqam yan melodîyan tê manakirin (During, 1994a, 102; During, 1994b). Bi şiklê **asā-beʿ (fingers) û mawājeb** “obligations, laws” di erebî da hatiye tercumekirin. Vê meqamê yan melodiyê cara ewil referansî dengbêjê Sasanî, Barbed (باربد) dikin ku navê wî weku “Fahl(a)bad/d, Bahl(a)bad/d, Fahl(a)wad/d, Fahr(a)bad/d, Bahr(a)bad/d, an Bārbad/d” jî di çavkanîyan da derbas dibe. Wî di serdema Xosrow II Perwîz (591-628) da ji bo her rojekê destanekê gotiye û bi vî şiklî 360 destan îcra kirine û her destanekê bi melodiyê cuda afirandiyê (During, 1994a, 102; During, 1994b, 84-85; Tafazzolî, 1988, 757-758). Di eslê xwe da peywendîya vê bi “dest” a kurmançî ra eşkere ye ku ev meqam li ser heşt tiliyên her du destan hatine avakirin û navê desatîna piraniya dest jî wergirtiye. Loma tê gotin ku destanên Barbed li ser heşt kîteyan ava dibûn. Îcar kifş e ku çemka destanê ji bo vegêrana helbestkî û kîteyî û melodîk hîn di serdema Sasanîyan da di nav xelkî da belav bûye û heya roja me jî xwe parastiyê û hatiye. Heke em menzûmbûna vegêrana destanê binin bîra xwe, ev jî nîşaneyê hevgirtina bîngê û çemkê û awayê îcrakirina vî cureyî ye di nav Kurdan da. Loma divê meriv nimûneyên vî cureyî yên kurdî ji aliyê kîteyî va jî berawird bike. Mimkûn e ku ew jî nîşaneyê hevgirtina vî cureyî ji hêla melodîk ve bide me. Çimkî destanên kurdî jî yên ku kêşa kîteyî parastine, bi piranî 8 yan 11 kîteyî ne.

Di gel vê pênase û zelalkirina navê destanê em ê ceribandina senifandineke nimûneyên destanên Kurdî bikin. Piştî em ê ji aliyê binyatê ve îskeleteke rêzerûdana hin binbeşên destanan jî derxînin. Lêbelê berî ceribandina me pêwîst e em senifandinên berî xwe binêrin ka di Kurdî da bi çî şiklî hatine kirin da ku em nexelîtin.

Dema em bala xwe didin xebata ewil a di vî warî da ku *Folklorê Kurmanca* a Heciyê Cindî û Emînê Evdal e (bnr. 2008). Destanên evînî yên mêjûyî weku epos, beyt, poêm û hikyat hatine binavkirin. Di qismê xwerû “êpos”ê da sih

¹ Li minakên weku “Emrah ile Selvi (Emrah û Selvi)”, “Karacaoğlan”, “Kerem ile Aslı (Kerem û Eslî)” û hwd. binêrin.

varyantên Kerr û Kulik hatine tomarkirin. Di qismê “êpos û beyt” da varyantên Mem û Zîn, Leyl û Mecerûm, Feqîyê Teyra, Şêxê Se(d/n)eanîna û Dota Gurcîa, Zembîlfiroş, Evdalê Zeynikê hatine tomarkirin. Di qismê “poêm û hikyat” da jî varyantên Zembîlfiroş, Xecê û Siabend, Leyl û Mecerûm, Dewrêşê Evdî hatine tomarkirin. Lê wisa xuyaye ferqa van varyantên di binya her du sernavên cuda da dirêjbûn û kurtbûna wan e. Çimkî di her du sernavan da jî varyantên xwerû menzûm hene, pexşan-menzûm têkel hene. Kifş e ku Cindî û Evdalê êposa Lafîni/Fransî ji bo cureyê destana lehengîya mêjûyî û herwiha hikyat, beyt û poêm bo cureyên destana evîni yên mêjûyî û cureyên din ê destanê bi kar anîne.

Dema meriv ji wir bala xwe dibe ser xebatên Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, dibîne ku ji bo cureyên destanê wan jî navên weku dastan, êpos, stranên epîkîyê, stranên tariqîyê (li ser têkoşîna kurdan dijî koledarê Osmanî û Eceman) û poêziya epîkîyê bi kar anîne. Ji binavkirinên wan jî dîyar e di nav vê cureyê da rengê lehengiyê/epîkîyê zal e. Lê di xebata Celîlîyan da beyt xisûsen ji bo qewl û vegêranên Êzdiyan hatiye bikaranîn. Wan di bin sernavê “poêziya epîkîyê” da varyantên Mem û Zîn, Sîyabendê Silivî û Xecê, Sêva Hacîya, Binefşa Narîn, Zembîlfiroş, Ûsibê Nebîya, Stî Ferxê, Elo Şêxanî, Xelîl Bego (Xelîl Beg û Gewrê), Edûla Mistefe Begê, Bozanê Lawê Pîrê, Xezal û Rizgan, Hesenîk û Asî/Asê tomar kirine (Celîl - Celîl, 1978a, 45-255). Li gorî senifandina me ev beramberî destanên evîni yên mêjûyî ne. Di bin sernavê “stranê tariqîyê” da varyantên weku Şêx Mîrzo, Miçoê Şêx Îsa, Seyîdxan, Elî Xarziya, Dewrêşê Evdî, Hamê Mûsê, Zeyneba Xûşk, Emê Gozê, Xozandaxê, Bavê Fexriya û Şêx Mûsik tomar kirine (Celîl - Celîl, 1978a, 256-321). Li gorî senifandina me ev beramberî destanên strankî yên evîni û lehengîya mêjûyî ne. Wan di binîya sernavê “êpos” da varyantên Rostem, Cangîr Palewan, Qeremanê Qetil, Hemze Pelewan, Elî Şêrê Xudê, Bêcan Pelewan û Beyta Xanê Kurda (Dimdim) tomar kirine (Celîl - Celîl, 1978b, 103-184). Li gorî senifandina me ev beramberî destanên lehengîya mîtolojîk û mêjûyî ne. Herwiha ji bilî van sernavan sernavekî bi navê “Şayîr û Aşiqê Cime'tê” hatiye danîn û di bin da varyantên Feqîyê Teyra û Evdalê Zeynê hatine tomarkirin (Celîl - Celîl, 1978b, 53-102) ku li gorî me ev weku vegêranên strankî yên li ser bîyografiya şair, dengbêj, aşiq û hozanan in ku vegêranên li ser Elî Berdeşaniyê dengbêjê Babanan jî di vê kategorîye da ne (bnr. Tewfiq Wirdî, 1972; Mihemmed Emîn, 2006).

Îzeddîn Mistefa Resûl (2010, 15) vegêrana gelêrî dabeşî du qisman dike bi navê “efsane” û “êpos” ku destnîşan dike êpos weku “beyt” jî di nav Kurdan da tê binavkirin. Lêbelê Resûl peyva “destanê” jî beramberî “êpos” a Yewnanî bi kar tîne û dibêje ku di eslê xwe da vegêran/çîrokek di destanê da heye, bes bi awayê îcrayê menzûm e ku jê ra “dastanî honrawe” dibêje, yanî vegêrana/çîroka helbestkî (2010, 31-34). Ew destanê peyveke kevin a Îranî dihesibîne ku li gorî me jî wisa ye. Jixwe leqebê Zal ê weku destan ji epîkbûn/lehengbûna mala Zal e li gorî me. Herçiqaş Kaplan (2022, 278-279) bibêje ku di nav xelkê û îcrakeran da çemka “destan”ê ne belav e û ji bo cureyê “beyt”ê nayê bikaranîn jî, em dikarin bibêjin îroj di nav Kurdên Hewraman/Goran da hê jî berbelav e û weku Dastanî Rostemî Zal, Dastanî Bijen û Menîce û gelekên din bi vî rengî tên binavkirin (bnr. Mokri, 1966). Lêbelê ji aliyekî ve jî rast e ku nayê gotin, xisûsen di nav zaravayê Kurmancîya jorîn da ev rabûye yan kêma bûye. Axir ev nayê wê manayê ku em “destan”ê dubare ji bo binavkirina cureyê gelêrî yê epîk û romantîk nikarin bi kar bînin. Îcar Îzeddîn Mistefa Resûl destan weku destana qaremanetî û destana dildarî û evîni dabeşî du qisman kirîye û herwiha gotîye ku ji ber hebûna motîfên epîk ên di nav destanên dildarî û evîni da rast e ku meriv navê “destan”ê li wan hikayetên bike. Ev argûman hem senifandina me piştrast dike hem jî nîşanî me dide ku peyva “destan”ê gelek berfireh e û hema hema hemû cureyên vegêranî yên epîk di hundurîne welew ku epîkbûna wan di rêza yekem da nebe, li ser vegêranê bi giştî zal nebe jî. Lêbelê herçiqaş Resûl neketibe dabeşkarîyeke hûrgilî jî kifş e ku di bin cureyê destanê da ji aliyê naverokî û şiklî ve di dirêjaya tarîxê da gelek cureyên dîtir peyda bûne di nav zar û zimanê Kurdî da. Loma meriv dikare çemka “destan”ê weku navekî giştî bigire û di bin da jî dabeşkarîyekê bike. Ya esil, Kaplan (2019a, 12-13) di xebata xwe ya Beyt û Destanên Kurdî da li ser wê fikirê bûye ku ev beytên bi navê Dimdim, Şêrê Kolana Qumrîyê, Memê Alan, Ferx û Stî, Hespê Reş, Kakemîr, Avdel Umeran, Zembîlfiroş û hwd. weku destan bînen qebûl kirin. Lê di xebata xwe ya 2022an da ketîye nav senifandineke dîtir. Em fikrên wê yên di xebata berê da bêtir nêzî xwe dibînin.

Di nav xebatên heyî da yê ku herî zêde serê xwe bi vê senifandin û dabeşkarîyê eşandîye Yaşar Kaplan e. Kaplan (2022, 289-290) di xebata xwe da destan, beyt û vegêranên strankî ji aliyê cureyî ve ji hev cuda dike û vegêranên strankî datîne beramberî “halk hikâyeleri” yên tirkî. Li ser beytan jî bêhtir di bin tesîra Hassanpour (1989, 11-12) da dimîne û naveroka beytan gelek berfireh digire. Heta ewqas berfireh digire ku di encama xebata xwe da dibêje meriv dikare destanan ji nav du komên sereke “beyt” û “vegêranên strankî” hilbijêre. Li gorî me Kaplan di vê senifandina xwe da ketîye nav du nakokîyan. Ya ewil ew e; di gel ku destanê weku çîrok, qiset, vegêrana lehengî pênase dike jî (2022, 276) beyt û vegêranên strankî yên ku li ser vegêrana rûdanekê (çi dîni çi sekuler) ava bûne derveyî destanê digire û heta destanê ji nav wan weku cureyekî dîtir destnîşan dike. Li vir ev pirs bi me re çê dibe; çima di gel ku ji aliyê naverokê û vegêranê ve weku hev dinirxîne jî di binavkirinê da ji hev cuda dike? Nakokîya duyem jî di berawirdkirina vegêranên strankî û “halk hikâyeleri” û “ballad”ên tirkî da ew herçiqaş mafdar be ku ferqa wan ji hev heye jî lê ne tenê ew ferq in ku nîşan dide. Ew bêtir ji aliyê teşeyî ve ferqên wan destnîşan dike. Lêbelê di nav “halk

hikâyeleri”yên tirkî da jî menzûm serdesttir e. Bi min ferqên herî muhîm di navbera wan da ji alîyê îcra û naverokê ve ne ku me li jor (dawîya sernavê destpêkê da) amaje pê kiriye. Weku din lehengên rûdanan, zîncîreya rûdanan di destanên evînî yê mêjûyî/beyt û vegêranên strankî yê Kurdî û “halk hikayeleri”yên tirkî da dişibin hev bêguman.

Dîsa xebateke din a ku Kaplan ji bo xwe referans girtiye, nameya doktorayê ya Parviz Jahany ye ku Jahany (2020, 9-11) di destpêkê da dema qala çêşnê destanê/beytê dike, îdia dike ku beyta kurdî û beyta erebî du çemkên ji hev cuda ne. Herçiqas di nav Kurdan da çemka “beyt”ê manaya vegêranên destanî/menzûm, çîrokên helbestkî û aheng û meqam girtibe (Hejar, 1369, 87) jî li gorî me û li gorî gelek lêkolîneran beyta di kurdî da ji beyta erebî hatiye qerzîkirin û di kurdî da di gel manaya xwe ya sereke manayeke cuda jî lê hatiye barkirin. Heta li gorî Hossein Mikaeili (1394/2016, 55) mimkûn e ku beyt ji çemka “bend”ê veguherîbe.

Li gorî me li vir mesele ne etîmolojîya peyvê ye. Ya esas binavkirineke weku “beyt” bivê nevê heye ji bo çêşnê destanê di nav Kurdan da, xisûsen jî bêhtir ji bo destanên mêjûyî. Çimkî dema Mikaeili (1394/2016, 56) mînakên destanan/beytan dide nimûneyên destanên lehengî û evînî yê mîtolojîk ên weku Rostem, Qereman, Bîjen û Menîjeyê nade. Jahany di eslê xwe da ji Mikaeili jî sûd wergirtiye û dabeşkarîyeke heta dereceyekê maqûl kiriye û ji aliyê teşeyê û vegêranê ve jî çarçoveyeke giştî bo vê cureyê danîye. Lê di binavkirinê da weku “navêki giştî” hîlbijartina “beyt”ê li gorî me ne di cih da ye. Li gorî me li ser manakirina Kurdan ya bi salan ku êdî bûye parçeyek ji ferheng û literatura zimanê wan meriv dikare “beyt”ê weku binbeşek û çêşnekî destanan nîşan bide.

2. Pêşnîyaz

Li gorî me destan ji bo van hemû cureyan weku çemka sîwan a herî maqûl e. Divê em bi zimanên din ra têkel nekin. Tirkî vê çemkê ji zimanên Îranî qerz kirîye û manaya herî spesîfîk dayê. Lê di Kurdî da manayake berfireh a destanê heye. Em hemû vegêranên ku xisûsîyetên lehengîyê yan jî şopên wê tê da mabin an jî vegêranên ku ji wê tradîsyonê nizilî bin weku destan qebûl dikin. Ji bo vê manaya berfireh a dastanê Michael L. Chyet (1991, 74-75) jî lêkolîneke ferhengî û manayî kirîye ku zanyarîyên wî dayî vê îdiaya me piştrast dike. Lê divê em destnîşan bikin ku di destanê da dema nasnameya nijadî/etnîkî pir lawaz bû û ew vegêran ji aliyê teşeyê ve bi temamî bû pexşan û motifên derasayî pir zêde lê hatine barkirin êdî ew vegêran vediguhere çîrokê. Bo nimûne çîrokên Mîrze Mihemed bi vî şiklî ne.

Weku Chyet (1991, 78-81) jî destnîşankirî ji bilî destanê di nav kurdan da çemka “beyt” jî di binavkirina van vegêranan da hatiye bikaranîn. Li gorî wî ev binavkirineke ku nayê înkarkirin û ji celebên binavkirinê yek e weku qewl, hikayet û destanê. Herwiha Hassanpour (1989, 11-12) bixwe jî “beyt” weku destan û vegêranên bi awaz û dengî pênase dike û xisûsen jî weku me berê amaje pê kirî ji bo mînakên destanên mêjûyî yê lehengî û evînî vê çemkê weku nav destnîşan dike. Li gorî me beyt weku Mikaeili jî amaje pê kirî bêtir ji ber teşeyê cureyan ve navê xwe daye wan vegêranên destanî. Loma binavkirineke li gorî teşeyê dê arêşeyên naverokî derxîne pêş. Loma li gorî boçûna me “destan” weku çemkeke sîwan e ku çemka “beyt”ê xisûsen ji bo hin binecureyên xwe di nav xwe da dihewîne.

Îcar em ê li vir ji senifandina Amir Hassanpour, Hossein Mikaeili, Parviz Jahany û Yaşar Kaplan a di vî warî da sûd wergirin. Lêbelê bi nêrîneke cuda senifandîneke cuda pêşnîyaz bikin û daînin vir. Dema em vê senifandinê jî dikin em ê weku bîngeha îsbatê xwe bispêrin binyata rêzerûdana vegêranên me destnîşankirî. Li vir piştî ku me senifandin nîşan da, em ê hewl bidin ceribandîneke danîna binyata rêzerûdanên hin çêşnên destanan bidin.

Tablo 1: Ceribandina Senifandina Destan û Binecureyên Wê

1. DESTAN

1.1. Destanên Lehengîya Mîtolojîk: Rostemê Zal

1.2. Destanên Evînî yê Mîtolojîk: Bîjen û Menîje

1.3. Destanên Lehengîya Mêjûyî

1.3.1. Beyt/Destanên Lehengîya Mêjûyî ya Neteweyî

1.3.1.1. Destanên Berxwedanî: Beyta Dimdimê, Beyta Bapîr Axayê Mengûr, Beyta Ewrehman Paşayê Baban, Diwazdeh Siwarîyên Merîwanê...

1.3.1.2. Zafername: Beyta Brahîmxanê Hekarî

1.3.2. Destanên Lehengîya Mêjûyî ya Navxweyî/Naveşîrî: Şerê Kolana Qumrîyê, Beyta Heme Teyar, Osê Zerî, Evdirehmanê Zorbaşî, Ebdullah Xanê Mukrî, Hemdîn û Şemdîn, Ehmedê Şeng, Hemê Mûsê û hwd.

1.4. Beyt/Qewl/Destanên Dînî

1.4.1. Destanên Lehengîya Dînî

1.4.1.1. **Xezewatname/Cengname:** Sîseban, Hespê Reş, Hetem, Kakemîr, Mûhemmed Henîfe...

1.4.1.2. **Futûhatname:** Avdel Ûmeran

1.4.1.3. **vegêranên Strankî yên Lehengîya Dînî:** Şêx Şehabedîn, Şerê Hesen Qele...²

1.4.2. **Destanên Zuhd û Îrfanê:** Zembîlfiroş, Şêxmend, Mîr Mihê, Şêx Senanî...

1.5. **Destanên li ser Afat û Karesatan:** Beyta Kulî, Beyta Xelayê...³

1.6. Beyt/Destanên Evînî yên Mêjûyî: (Romance/Ballad/Halk Hikâyeleri)

1.6.1. **Destanên Evînî û Lehengî Têkel:** Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kerr û Kulik, Sîyabend û Xecê, Las û Xezal, Ferhad û Şîrîn, Şor Mehmûd û Merzingan...

1.6.2. **Destanên Xwerû Evînî:** Xelîl Beg û Gewrê, Heso û Nazê, Memê û Eysê, Cembelî û Binefs, Sêva Hacî, Bozanê Lawê Pîrê...

1.6.3. **vegêranên Strankî yên Evînî:** Emerkê û Qîza Tucar Axa, Salih û Nûrê, Dîlbera Memed Begê Mîrê Tatosê, Mihemedo Ronî, Bavê Fexrîya û hwd.⁴

1.7. **vegêranên Strankî yên li ser (Bîyografîya) Şair û Dengbêjan:** Evdalê Zeynê, Feqîyê Teyran, Elî Berdesanî...⁵

Herçiqaqas hagîyografi/menaqîbname, vegêranên eskatolojîyê, pêkenî bi beytan hatîbin îcrakirin jî li gorî me ew di nav cureyên weku efsane, mîtos û pêkenokan da cih digirin. Ew tenê jî hêla şikilî ve beytkî ne û bi dengî tîn îcrakirin. Weku din jî aliyê naveroka xwe ve bi ser cureyên din ên vegêrana gelêrî ve ne. Loma em rast nabînin ku ew di nav destanan da bi cih bin.

Xisûsiyeteke sereke ya senifandina me ew e ku hema hema di hemû binbeşên destanê da epîkbûn xuyaye. Aliyê epîk di hin cureyan da li pêş e, di hin cureyan da li paş e û di hin cureyan da jî pir kêr û lawaz bûye û rengê xwe veguherandîye terbiyeya nefîsê yan jî micadeleyên manewî.

Em ê destanan jî aliyê teşeyî ve nenirxînin. Çimkî li gorî me Kaplan (2022, 282-287) di xebata xwe da bi awayekî zelal behs jê kiriye. Di nimûneyên me hilbijartî da jî yan xwerû menzûm yan jî menzûm-pexşan têkelhev hatine îcrakirin. Li gorî nêrîna me di serî da destan bi giştî menzûm dihatin îcrakirin û bi demê ra dema ku çanda menzûm li cem îcrakeran lawaz bû, pexşan jî tîkelî nav bû û vêca awayê îcrayê bû menzûm-pexşan tîkel. Herwiha weku me di pênaseya destanê da jî amaje pê kir, di eslê xwe da helbesta gelêrî/destan bi 8 kîteyan tîn îcrakirin û kêr nimûne 11 an 7 kîteyî ne. Lêbelê bi demê re ev kêş jî xerab bûye û weku Kaplan destnîşankirî sê cure derketine ku wezna bikêş, wezna serbest û wezna şikestî jê ra hatiye gotin.

Em ê di vê xebatê da bi awayekî binyatî jî aliyê zincîreya rûdanê ya cureyên destanên me behskirî nîşan bidin da ku kifş bibe di eslê xwe da ev gişt jî kanîyekê nizilîne û bi demê ra di binyata xwe ya rûdanê da hin xisûsiyetan jî dest dane û hin jî wan jî mane. Mîmkûn e bi serê xwe ev xisûsiyeta jî isbat bike ku vegêranên Kurdî yên me nîşan dayî, asayî ye di bin navê destanê da rêz bibin. Me di serî da binyata rêzerûdana destanên lehengîya mîtolojîk derxistin û li gorî wê di destanên dî da xalên jê kêmbûyî yan lêzêdebûyî di bin sernavên dî da destnîşan kirin. Me jî bo her rêzerûdanekê sembola tîpekê danî ku halê tam weku A, B, C, D, E, F, G, H rêz dibe û herwiha sembola evîndarbûnê jî bi şiklê dil (♥) hatiye destnîşankirin. Piştî her di kîjan binecureyê destanê da kîjan rêzerûdan tîk çûbe ango jê derketibe, me di ser ra qevaziye û sembola wê nîşan nedaye. Ev binyat bi mînakên di destên me da sînorkirî ne, mîmkûn e di hin varyantên din da bi awayekî awarte hin rêzerûdan jê kêr an lê zêde bibin. Lê em ghiştin wê qenaetê ku bi

2 Vî sernavî bi giştî binyata xwe ya destanî jî dest daye. Ev vegêran bi şewaza kilamkî tîn îcrakirin û herî zêde motifên lehengîyê tê da mewcûd in. Loma meriv dikare vî binsernavî weku cureyekî destanan nehesibîne.

3 Ji bilî lehengî û evînê temayeke din a destanan afat û karesat in ku bi serê milletekî da hatine. Lê me metnên berdest yên van mînakên nedîtin ku em binyata wan a rêzerûdanê derxînin.

4 Di van stranana da vegêrana klasîk a destanî tîk çûye û bi tenê jî aliyê naverok û motifên xwe ve weku berdewamiya destanên evînî maye. Loma meriv dikare vê beşê jî nav cureyên destanê nehesibîne û tenê weku stranên ku epîkiyê yan jî evîna trajîk vedihewînin qebûl bike.

5 Lazim e li vir em destnîşan bikin ku ferqek di navbera vî cureyî Kurdî û cureyê Tirkî yên weku “**Âşık Şairlerin Romanlaşmış Hayatları** (Jiyana Novelî ya Şairên Aşiq) an jî Biyografîk Halk Hikâyeleri (Hikayetên Gelêrî yên Biyografîk)” da heye. Di yên kurdî da qala jiyana dengbêj û şairan bi awayekî xwerû tê kirin. Di yên Tirkî da aşiq û hozan weku lehengekî di nav vegêranê da cih digirin. Di eslê xwe da rûdan, rûdana evînî ya aşiq û hozan bixwe ye. Yên Tirkî bi piranî di binyata destanan da tîn îcrakirin. Lêbelê di van vegêranên Kurdî da binyata destanî tîk çûye û loma ev jî weku binecureyekî destanan dikarin neyên hesibandin.

piranî bi vê binyata me nişan dayî destan ava dibin.

Binyata destanên lehengîya mîtolojîk⁶:

- A. Destpêk (rewşa berî leheng tê teswîrkirin)
- B. Malbata leheng û hatina dinê ya leheng
- C. Mezinbûn û îmtihanên lehengiyê
- D. Spartina wezîfeyekê li leheng
- E. Rêwîtiya Leheng (di serê rêwîtiyê da astengî derdikevin)
- F. Hewildana ji bo pêkanîna wezîfeyê (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî tên berterefkirin
- H. Serkeftin û veger

Binyata destanên evîna mîtolojîk⁷:

- A. Destpêk (formulên destpêkê)⁸
- B. Danasîna leheng, malbata leheng yan jî statuya leheng
- D. Spartina wezîfeyekê li leheng
- E. Rêwîtiya leheng û hewildana pêkanîna wezîfeyê (astengî derdikevin)
- F. Hewildana ji bo pêkanîna wezîfeyê (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- ♥. Evîndarbûn (astengî berdewam in)
- G. Astengî tê berterefkirin
- H. Evîndar digihêjin hev û veger

Binyata destanên lehengîya mêjûyî⁹:

- A. Destpêk (rewşa berî leheng/an tê teswîrkirin)
- B. Malbata leheng/an û hatina dinê ya leheng/an (mimkûn e di hin varyantan da hatina dinê ya leheng/an neyê vegêran çimkî mêjûyî û asayî ye)
- C. Mezinbûn û îmtihanên lehengiyê (mimkûn e di hin varyantan da tenê îmtihan xuya bin)
- D. Spartina wezîfeyekê li leheng/an
- E. Rêwîtiya leheng(an)/plansaziya leheng(an) (di serê rêwîtiyê/plansaziyê da astengî derdikevin)¹⁰
- F. Hewildana ji bo pêkanîna wezîfeyê (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî (tên berterefkirin û dibe sebeba serkeftinê yan nayên berterefkirin û dibe sebeba têkçûnê)
- H. Serkeftin an jî Têkçûn

Binyata destanên lehengîya dînî¹¹:

6 Ev binyat li gorî Şaxêd Eposa Rostemê Zalê Kurdî ya Heciyê Cindî (bnr. 1977) û Rustemê Zal û Heftxanên Wî yên di Şehnameyên Kurdî da (bnr. Valî, 2021) hatiye avakirin.

7 Ev binyat li gorî çend varyantên Goranî yên Bijen û Menîceyê hatiye avakirin (Mokri, 1966, 1-40; Nik Reftar, 2013, 42-144). Di rêzerûdanên destanên evîna mîtolojîk da di van varyantan da rêzerûdana mezinbûn û îmtihanên lehengiyê jê ketiye û rêzerûdaneke nû ya bi navê “♥. Evîndarbûn” lê zêde bûye. Lê ev nayê wê manayê ku di hemû varyantan da rêzerûdana mezinbûn û îmtihanên lehengiyê dê jê derkevin. Çimkî em di destanên mêjûyî yên evîni û lehengî têkel da dibînin ku ev rêzerûdan careke din vegeyriyaye. Weku mînak li varyanta Lescot a Memê Alan binêrin.

8 Di varyanta Mokri da formula destpêkê weku çanda helbesta klasîk ya piştî Îslamê bi pesn û medhê Xweda û pêxember dest pê kiriye. Lêbelê di varyanta Nîkreftar da ev qisim tune ye.

9 Ev binyat li gorî çend varyantên destana Kela Dimdimê hatiye avakirin (bnr. Kaplan, 2019b, 57-154; Celîl - Celalî, 2011, 35-86; Prym - Socin, 1890, 180-201).

10 Ji ber ku di tarîxê da rasteqîniya wê heye, ev rêzerûdan ne weku rêwîtiya leheng, dibe ku weku plansaziya leheng xuya be.

11 Ev binyat li gorî destana Qewlê Newala Sîsebanê (bnr. Demir, 2012, 29-73) û Qewlê Hespê Reş (bnr. Kaplan, 2019a, 213-248; Yıldız, 2021, 177-205; 220-265) hatiye avakirin.

- A. Destpêk (pesn û medhê Xweda û pêxember û kesayetên pîroz)¹²
- D. Fermana şerî/xezayê yan jî wezîfeya leheng
- E. Rêwîtiya Leheng (di serê rêwîtiyê da astengî derdikevin)
- F. Hewildana ji bo pêkanîna wezîfeyê (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî tên berterefkirin
- H. Serkeftin û vegeer

Binyata destanên zuhd û îrfanê¹³:

- A. Destpêk (formula destpêkê)
- B. Danasîna leheng, malbata leheng yan jî statuya leheng
- ♥. Evîndarbûn (xewn yan jî bi şiklekî din)
- E. Hewildana ji bo gihîştina evîndar û bi rê ketin/cihguhertin/rêwîti (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî (bên berterefkirin jî dibin sebeba trajediyê)
- H. veguherîna evîne ber bi trajediyê

Binyata destanên evîni û lehengî tîkel¹⁴:

- A. Destpêk (rewşa berî leheng tê teswîrkirin)
- B. Malbata leheng û hatina dinê ya leheng
- C. Mezinbûn û îmtihanên lehengiyê
- ♥. Evîndarbûn
- E. Hewildana ji bo gihîştina evîndar û bi rê ketin/cihguhertin/rêwîti (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî (bên berterefkirin jî dibin sebeba trajediyê)
- H. veguherîna evîne ber bi trajediyê

Binyata destanên xwerû evîni¹⁵:

- A. Destpêk (evîndar û malbatên wan tînan nasandin)
- ♥. Evîndarbûn
- E. Hewildana ji bo gihîştina evîndar û bi rê ketin/cihguhertin/rêwîti (astengî carinan li vir dest pê dikin)
- G. Astengî (bên berterefkirin jî dibin sebeba trajediyê)
- H. veguherîna evîne ber bi trajediyê

Binyata vegêranên Strankî yê Evîni¹⁶:

- A. Nasandina evîndaran û pesnê wan (mimkûn e di temamê stranê da dewam bike)¹⁷
- G. Astengî û rexneya li astengî û astengêran

12 Ev destpêk bi piranî bi karîgeriya metnên edeba klasîk a di vî warî da lê zede bûye. Di varyantên gelêrî da xaseten destpêkeke bi vî rengî naxuye. Helbet dîsa rêz û hurmet û pesnê Xweda û pêxember di nav bendan da derbas dibe lê ne bi destpêkeke formuleyî.

13 Ev binyat li gorî çend varyantên destana Zembîlfiroş (bnr. Samur, 2012, 104-145; Kaplan, 2020, 41-47; Filiz, 2021, 417-423) û varyanteke Şêxê Senan (bnr. Sadîni, 2020, 239-336) hatiye avakirin.

14 Ev binyat li gorî varyanta Memê Alan ya ku Roger Lescot (1942) berhev û amadekirî û çend varyantên din ên Memê Alan (bnr. Hikmet, 2023, 45-86) herwiha li gorî varyanteke Sîyabend û Xecê (bnr. Semend, 2006) û li gorî varyantên Kerr û Kulik ên di *Folklor Kurmanca* (Cindî - Evdal, 2008, 47-303) da hatiye avakirin.

15 Ev binyat li gorî destana Xelîl Beg û Gewrê/Têlî Perîşan hatiye avakirin (bnr. Subaşı, 2023, 158-159).

16 Ev binyat li gorî stranên Emerkê û Qîza Tucar Axa, Salih û Nûrê, Dîlbera Memed Begê Mîrê Tatosê, Mihemedo Ronî, Bavê Fexriya hatiye avakirin. Di vî binyatê da kifş e ew vegêrana klasîk a destanî tîk çûye û bi tenê ji aliyê naverok û motifên xwe ve weku berdewamiya destanên evîni maye. Loma meriv dikare vê beşê ji nav cureyên destanê nehesibîne û tenê weku stranên ku epîkiyê yan jî evîna trajîk ve-dihewînin qebûl bike.

17 Binyata evîndarbûnê (♥) jî di temamê stranê da tê vegêran. Yanî meriv di giştiya stranê da pê derdixe ka her du evîndar çawa bûne evîndarên hev.

H. Trajedîya evînê (astengêr bên tunekirin jî evîn her trajîk dimîne)

Dema meriv bi giştî bala xwe dide binyatên binbeşên destanan xisûsen ji aliyê hevparîya hin rêzerûdanan ve bala me dikêşe. Ev yek jî dîsa li gorî me nîşaneyek e ji bo ku meriv bibêje gişt ji kanekê nizilîne. Bo nimûne rêzerûdana astengî û berterefkirin an berterefnekirina astengîyan di hemû binbeşan da xuyane. Di eslê xwe da ev nîşanî me dide ku lehengek di hemû destanan da heye û rûbirûyê astengîyan dibe. Îcar ev leheng di hemû binbeşan da weku hev nehatiye vegêran an jî di hin binecureyan da xisûsiyetên xwe yên lehengiyê ji dest dane. Xisûsiyetên weku hatina wan a dinê ya bi awayekî derasayî, mezinbûna wan, îmtihanên wan û hwd. Dîsa di destanên ku evîn têkelî nav bûne em rêzerûdanên bi leheng ra eleqedar kêmbûnê ku ev jî xaleke hevpar e di navbera destanên evînî da. Herwiha kifş e ku binyata rêzerûdana destanên tam bêhtir nêzikî destanên lehengîya mîtolojîk in. Lê her çî evînî, mêtûyî, dînî bin kifş e ku weku binyat ji yên lehengîya mîtolojîk xir û xalî nînin. Dîsa di çarçoveya destanên kurdî yên evînî de em dibêjin ku evîna di wan da bi piranî trajîk e. Evîndar nagihêjin hev, ger bigihêjin hev jî bi awayekî zahîrî, demkurt, bi keder e û bi piranî gihiştina wan a li hev dimîne hêvîya dinyayeke din.

ENCAM

Binavkirina destanê li vegêranên jorîn di serî da tevlihevîya binavkirina van vegêranan safî dike. Çimkî hîn ev nîqaş berdewam e: Gelo Rostemê Zal, Bîjen û Menîce, Dimdim, Ewrehman Paşayê Baban, Evdîrehmanê Zorbaşî, Memê Alan, Dewrêşê Evdî, Kerr û Kulik, Zembîlfiroş, Sîseban, Xelîl Beg û Gewrê, Heso û Nazê destan in, beyt in, qewl in, stran in yan hikayet in? Li gorî min senifandineke bi rengê ya li jor heya radeyeke bilind vê nîqaşê aşt û meseleyê safî dike.

Ev senifandin û nêrîna li jor xebatên me yên di vî warî da ji teqlîdkirina xebatên tirkî û ewropî dûr dixîne. Bi vî rengî em ne mecbûr in lîteratura ziman û edebîyata xwe bi ser lîteratura tirkî û îngilizî da bixwînin. Lê helbet bila ev gotin neyê wê manayê ku divê meriv ji xebatên wan ên pênaseyî û teorîk sûd wernegire. Li vir qesda me ji teqlîdkirinê ya lîteatur û binavkirinê ye.

Di tesbîtkirina cureyekî edebî da ji bilî naverok, teşe û îcrakirinê xaleke din a muhîm jî binyat û xisûsen binyata rêzerûdana cureyî ye.

Dema meriv bala xwe dide binyata rêzerûdanên me behs kirî, eşkere dibe ku ev vegêran bi giştî ji hev nizilîne. Li gorî me di serî da destan xisûsen di serdema mîtolojîk da komîja van hemû binecureyan bûn. Yanî tê da hem lehengî hem evîndarî hem jî karesat û afatên civakî hebûn. Bi demê ra çî bi tesîra dîn û ayînan çî jî bi tesîra tarîxê ev vegêranên destanî ji hev qetiyên îcar her yek ji wan dîsa bi heman şewazî, bi heman miqamî, bi heman teşeyî, bi heman îcrayê hatine neqilkirin. Piştî demekê şûnda îcar di şewaz, miqam, teşe û îcraya wan da jî deformasyon pêk hat û heta bi vî halî gihiştine îroj. Bêguman piştî ku weku cure ji hev qetiyên ji aliyê naverok û motîfan ve jî hin ji dest dan, hin jî lê zêde kirin. Lê ev guherîn û veguherîn tev da vê rastîyê ji holê nabin ku ev binecureyên me tesbîtkirî tev şaxên darekê ne.

Di nav van cure û binecureyên me diyarkirî da em deriyê nîqaşê ji bo destanbûn yan nedestanbûna sernavên weku “1.4.1.3. vegêranên Strankî yên Lehengîya Dînî”, “1.6.3. vegêranên Strankî yên Evînî” û “1.7. vegêranên Strankî yên li ser (Bîyografiya) Şair û Dengbêjan” vekirî dihêlin. Me bixwe jî derbarê van sernavan da raya xwe got ku ew weku tema ji destanan nizilîne, lêbelê xisûsen ji aliyê rêzerûdanê ve gelek lawaz bûne û xisûsiyetên cureyê destanbûnê ji dest daye.

Mimkûn e hin mînakên destanan li mînakên me zêde bibin an jî varyantên tekûztir bikevin şûna wan. Loma enca ma ku em di vê xebatê da gihiştinê bi varyant û xebatên ber destê me sînorkirî ne.

ÇAVKANÎ

- Başgöz, İlhan. *Türkülü Aşk Hikâyeleri: Bir Gösterim Olarak*. İstanbul: Pan Yayıncılık, 2012.
- Boratav, Pertev Naili. *Halk Hikâyeleri ve Halk Hikâyeciliği*. İstanbul: Tarih Vakfı, 2011.
- Bozarslan, M. Emin. “Haydarîyên Giştî di Heqê Kovara ‘Jîn’ da”. *Jîn: Kovara Kurdî-Tirkî/Kürtçe-Türkçe Dergi 1918-1919*. amd. M. Emin Bozarslan. 1/7-89. Uppsala: Weşanxana Deng, 1985.
- Celîl, Casimê - Celalî, Emerê. *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrin*. İstanbul: Nûbihar, 2011.
- Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurdî I*. Moskova: Naûka, 1978a.
- Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurdî II*. Moskova: Naûka, 1978b.
- Chyet, Michael L. “*And a Thornbush Sprang up Between Them*”: *Studies on Mem û Zîn a Kurdish Romance*. Berkeley: University of California, 1991.
- Cindî, Heciyê. *Şaxêd Êposa Rostemê Zalê Kurdî*. Yêrêvan: Neşîreta Akadêmiya Komara Sovêtiyêye Sosiyalîstiyêye Ermenîstanêye Ulma, 1977.
- Cindî, Heciyê - Evdal, Emînê. *Folklorê Kurmanca*. Stenbol: Avesta, 2008.
- Demir, Ahmet. *Qewlê Newala Sîsebanê*. İstanbul: Nûbihar, 2012.
- During, Jean. “Dastân”. *Encyclopædia Iranica*. VII/1/102, 1994a. Erişim 10.01.2024. <http://www.iranicaonline.org/articles/dastan-1>
- During, Jean. “Dasâtîn”. *Encyclopædia Iranica*. VI/1/84-85, 1994b. Erişim 10.01.2024. <https://www.iranicaonline.org/articles/dasatin>
- Filiz, M. Şirin. “Di Navbera Folklor û Edebiyata Klasîk de Çîroka Zembîlfiroş”. ed. Oktay Bozan vd. *Sultanlar Şehri Silvan Eğitim-Kültür-Medeniyet*. 415-424. Ankara: Sonçağ Akademi, 2021.
- Hassanpour, Amir. “Bayt”. *Encyclopedia Iranica*. IV/1/11-12, 1989. Erişim 20.01.2023. <https://www.iranicaonline.org/articles/bayt-folk-art>
- Hikmet, Bedran. *Danberheva Memê Alan û Mem û Zînê: vekolîneke Folklorî*. Diyarbakır: Lîs, 2023.
- Jahany, Parviz. *Berawirdkirina Beyta Mem û Zînê ya Kurmancî (Varyanta Oskar Mann) û Mem û Zîna Mîrza ya Hewramî*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Doktora Tezi, 2020.
- Kaplan, Leyla. “Li Gorî Çar Epîzotan Berawirdkirina Çar Varyantên Destana Zembîlfiroş”. *Nûbihar Akademî* 13/7 (2020), 33-50.
- Kaplan, Yaşar. *Beyt û Destanên Kurdî*. İstanbul: Nûbihar, 2019a.
- Kaplan, Yaşar. *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrin*. İstanbul: Nûbihar, 2019b.
- Kaplan, Yaşar. “Di Edebiyata Kurmancî ya Gelêrî da Beyt û Taybetîyên Wê”. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 8 UMS’20, (2020), 133-136. <https://doi.org/10.18506/anemon.832171>
- Kaplan, Yaşar. “Helsengandinek li ser Cureyên vegêranê yên di Folklorê Kurdî da (Destan, Beyt û vegêranên Strankî)”. *International Journal of Kurdish Studies*, 8/2, (2022), 273-292. <https://doi.org/10.21600/ijoks.1144690>
- Keskin, Necat. *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. İstanbul: Avesta, 2019.
- Lescot, Roger. *Textes Kurdes Deuxième Partie Mamé Alan*. Beyrouth: Institut Français de Damas Collection de Textes Orientaux, 1942.
- Mihemmed Emîn, Ziyad. *Dîwanî Elî Berdeşanî*. Silêmanî: Enstîtuyutî Kelepûrî Kurdî, 2006.
- Mikaeili, Hossein. “Beyt der Edeb-ê Folklor-ê Kurdî”. *Pijûhişnâme-yê Edebîyât-ê Kurdî*. Sâl-ê Evvel, Şomâreyê 1, (Pâyîz 1394/2016), 51-76.
- Mokri, Mohammad. *Dastanê Bijen û Menice*. Paris: Librairie Klincksieck, 1966.
- Nîk Reftar, Keyomers. *Keşkol: Dastanê Nayabê û Kemyabê Kurdî Goranî (Hewramî) û Çend Basê Lazimê*. Silêmanî: Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, 2013.
- Oğuz, M. Öcal. *Halk Hikâyeleri*. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü, 2008.
- Pehlivan, Gürol. “İlhan Başgöz’ün Biyografik Türk Halk Hikâyeleri Unvanlı Doktora Tezi Üzerine”. *Folklor/Edebiyat Dergisi*. 27/1 (2021), 47-68. <https://doi.org/10.22559/folklor.1419>
- Prym, Eugen - Socin, Albert. *Kurdische Sammlungen*. St. Petersburg: Commissionäre der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften, 1890.
- Resûl, İzzeddin Mistefa. *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaney Aras, 2010.
- Resûl, Şukriye. *Edebî Folklorî Kurdî*. Hewlêr: Dezgay Muzîk û Kelepûrî Kurd, 2008.
- Sadinî, M. Xalid. *Feqiyê Teyran: Jiyan Berhem û Helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar, Çapa 10em, 2020.
- Samur, Aziz. *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, 2012.
- Semend, Siyabedov. *Siyabend û Xecê*. İstanbul: Hivda İletişim, 2006.
- Subaşı, Kenan. “Pirnavîya Cureyên vegêranên Gelêrî û Nestandartbûna Wan di Kurdî de”. *Folklorê Kurdî*. Bergê Duyê. Zakho: Senterê Xaxo bo vekolînê Kurdî, 2022.

Subaşı, Kenan. “Fesad û Bêbext di Trajediya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evînî yên Mêjûyî”. *Mukaddime* 14/Özel Sayı 1 (2023), 148-176. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035>

Tewfîq Wirdî, Mihemmed. *Hendî le Beyt û Helbestekani Elî Berdeşani*. Necef: Çapxaneyî el-Qeda’, 1972.

Tafazzolî, Aḥmad. “Bārbad” *Encyclopædia Iranica*, III/7/757-758, 1988. Erişim 10.01.2024. <https://www.iranicaonline.org/articles/barbad-minstrel>

Valî, Şahab. *Şahnameya Kurdî Rustemê Zal û Heft Xana Wî*. Stenbol: Avesta, 2021.

Yıldız, Ayhan. *Qewlê Hespê Reş: Lêkolîn û Metn*. Van: Peywend, 2021.

Extended Abstract

The branch of science that identifies, compiles, classifies and analyzes the material and spiritual culture of a nation is called folklore. Folklorists use folklore studies to recognize a nation itself or to introduce itself to other nations of the world. Folklorists who carry out these studies need to recognize and classify their field of science as in other branches of science. Because this field, which we call folk life, does not maintain its continuity as a whole and is divided into different branches and sub-branches over time. Undoubtedly, one of the important branches of folklore is folk literature. However, folk literature is also divided into many sub-branches within itself. In this study, we have studied folk narratives, which is one of the sub-branches of folk literature, and the epic/dastan genre within it. Our aim in this study is to show and use the term “epic/dastan” as an inclusive term for all other Kurdish epic narratives. Because in Kurdish folklore studies there is a clear confusion of literature and a problem of polysemy. In this study, we have created a new classification of epic narratives by analyzing Kurdish epic narratives in terms of event chain structure. In addition to the classification and suggestions we put forward in this study, we have also shared the studies and discussions on this subject in the field before us.

Our article is shaped on three main topics. In the introduction part of the article, it is mentioned to what extent and when the studies on classifying and defining folklore products among Kurdish studies started. From the studies carried out in the Kurdish Neşî-i Maarif Cemiyeti's *Jin Magazine* published in 1919-1920 to the studies carried out in this field until today are briefly mentioned. Issues such as which method they used while conducting these studies and what possible mistakes they made were discussed.

In the second part of our study, examples of definitions, naming and classifications made on the epic genre, especially in Kurdish folklore studies, are discussed and analysed one by one. These studies were compared and a discussion of the literature was initiated. In particular, from the works of the Soviet-era folklorists Hacıyi Cindi, Emini Evdal, Ordikhani Jalil and Jalili Jalil and the definitions and classifications they presented to us, to the works of folklorists such as Izeddin Mostafa Resool and Shukriya Resool, who studied folklore in the south of Kurdistan, especially in the Sorani dialect, as well as Amir Hassanpour, Michael L. Chyet, Hossein Mikaeili, Parviz Jahany, Yaşar Kaplan, Necat Keskin, and many other researchers and academics working on Kurdish folklore, especially on the epic genre, are discussed under this title and a comparative analysis is made.

After the introduction and discussion section, we have made a proposal for the definition and classification of the genre based on the collected texts and many examples from the variants of the epic genre in Kurdish. While doing this study, a classification attempt was made based on the works of the above-mentioned researchers who worked in this field before us. Our classification has been a structural classification type based on the chain of events. In fact, the sequence of the event chain structurally of the epic genres and subgenres, which are named on the basis of their content and more prominent themes, has been examined and the claim that these genres and subgenres are not actually independent genres and that they derive from each other has been defended. We first applied the event chain sequence/scheme to the epic genre sung on mythological heroes. Then, based on the event sequence of this genre, we examined the elements decreased or added in the event sequence in other subgenres and created a general scheme. For each event flow, we would determine a symbol consisting of letters, and our complete scheme is as follows: “A, B, C, D, D, E, F, G, H” apart from these letter symbols, we also used the heart (♥) symbol for the love or falling in love phase. Each of these symbols shows a specific phase of the event flow in the event chain. Even if there are not many differences in the arrangement of the scheme, it is possible to observe that some symbols/event flow are not seen in different sub-genres of the epic genre and in these cases, the non-existent event flow is skipped over and the next symbol or event flow is passed to the next symbol or event flow. This sample scheme is limited to the narrative types we have. It is also possible that this scheme may change in different variants of the same narratives. However, in the end, we have come to the conclusion that in general, all epic variants are shaped on this event flow scheme in a complete or incomplete way, and even the sequence does not change much.

As a result of our study, the epic genre is divided into seven main headings/genres and twelve sub-headings/genres, especially “vegêranên Strankî yên Lehengîya Dînî (Narrative Songs Narrating Religious Heroism)”, “vegêranên Strankî yên Evînî (Narrative Songs on Love)”, We annotated three sub-titles/genres such as “vegêranên Strankî yên li ser (Biyografiya) Şair û Dengbêjan (Narrative Songs Telling the Biographies of Dengbejs and Poets)” and stated that the event sequence of these narratives was deformed over time and structurally distorted and evolved into a different genre.

Pêvek: Senifandina Destanan bi Awayekî Şematîk

